

Giringiya ewlekariya neteweyiya Kurdistanê

Di bin bandora proseya nûzayînê ya bi jan ku navçeya rojhilata nêvê têde derbas dibe û netebatiya li welatên Kurd lê heyî, nemaze li Îraqê.
Her weha, li gor rola pêşeng a berçavkirî ya tevgera rizgarîxweziya neteweyî a demokrat a kurd bi taybetî li Îraqê. Di warê proseya guherîna demokratîk û şerê li dijî terora tundrew ya Îslamî û neteweperest û şovînîst, tevlî serxistina proseya siyasî a aştiyane bê bikaranîna tundûtûjî û zorê li hundir bi alîkariya civaka navneteweyî.
Lêbelê hindek astengên micid li pêşiya hêzên guherînxwaz de hene, nemaze hêzên gelê Kurd li herêma Kurdistana Îraqê a federe. Kurd li herêma Kurdistanê rastî astengên here mezin tên, ne tenê ji aliyê endamên hevbendiya Îraqî di hikûmet û parlementoyê de tevlî hevpişkên wan yên berê di nav refên opozisyona niştimaniya Îraqê de, lê her weha ji aliyê bermayên rêjîma jinavçûyî û girûpên çekdar û rêxistina Qayidê. Ji aliyê din ve, biveya rêjîmên cîranên Îraqê, nemaze Îran û Sûriyê û Tirkiyayê. Van rêjîman herdem hewil dane, didin ji bo tunekirina ezmûna herêma Kurdistanê bi hemû şêweyên leşkerî û aborî û yên dinê. Bê guman, pêwîst e em li berxwe bidin û rêveçûna xwe bidomînin. Di destpêkê de, divê bunyadgeriya Kurdistanê bête bihêzkirin da ku bikaribe li dijî teqîn û derbaskirinê, raweste. Tevlî parastina ewlekariya neteweyî û peydakirina pêwîstiyên berxwedan û kartêkirinê.
Diyar e ku Kurdistana Îraqê di vê qonaxê de rola bingeha tevgera kurdî dilîze, ji aliyê siyasî û manewî ve. Parastin û pêşvexistina ezmûna wê erkekî kurdistanî ye.

Ji ber ku dewrûbera herêmê a mirovî û cografîk dirêjahiya neteweyî a stratejîk pêktîne, proseya kartêkirina erênî dibe erkekî serekî yê tevahiya hêz û aliyên Kurdistanê di vê qonaxa nazik û giring de. Pêwîst e danûsitandin û hevdîtin û alîkarî bi hemû şêweyên lêgal û rewa were destpêkirin û bihêzkirinê. Armanc jî ewe ji bo çareserkirina aştiyane ya doza Kurdî û dozên neteweyên kurdistanê û bi serxistina proseya demokratîk di çarçoveya lihevhatina niştimanî li her welatekî. Her weha, bi mebesta bihêzkirina aramî û tenahiya sivîl û hevjiyanê di navbera hemû pêkhateyên neteweyî û olî û mezhebî li jêr saya azadî û wekhevî û dûr ji zordarî û sêwana rêjîmên, despotîk û totalîter û terorê de.